Beyta olî

Ev beyta xweşik, sala 1837ê Zayînî, ji aliyê Evdiselam ê Xalidî Zîbarî ve, ku ji xelkê Barzan e, hatiye lêkirin

Amadekirin: Cankurd

Guh bidene behsê xweş
Gelî kes, sah'ib goş
Xudê nekin firamoş

Eger ciwan, eger pîr
Kesî Xudê biket ji bîr
Qiyametê dê bêt d'erîr

Kesê Xudê nenasî
Ron nabê qelbê qasî
H'sil nabê xelasî

Xaliq yek e, bê heval e
Ne manende, ne mîsale
Ne mirdine, ne zewale

Ne manende, ne nez'îre
Ne şerîke, ne muşîre
Ne muî'ne, ne nesîre

Ya Reb tu zor bilindî
Bê mîsal û manendî
Bo te nîne çon û çendî

Ji vî çonî têt xeber
Ew ne cîsme, ne cewher
Ne e'rde, ne beşer

Ew xaliqe bi tenê
Munezzehe ji mirdinê
Hem ji xewê û xarinê

Rewanîne îttîsal û înfîsal
Bû me'bodê zulcelal
Digel a'lemê ma şubhê zîlal

Rebbî tu şahê metîn
Îcad kir ji ava muhîn
Çend sûret têt mez'her şirîn

Xudê hene heft sîfat
Qedîmin ew wekî zat
Yek îlme, ya dî h'eyat

Yek qudrete, ya dî bîstin
Yek îrade ye, ya dî dîtin
Sabiê' wan axiftin

Kelmê wî dûr ji h'erf û denga
Zatê wî munezzehe ji teslîsa Firenga
Muqqeddese ji hindê elwan û renga

Ji hindê cumleyê mumkînatan
Ji cewahir we zerratan
Têkda mezherin bo sîfatan

Got ya hemû cismekin, tu canî
Got ya hemû darekin, tu banî
Got ya hemû şehrekin, tu xanî

Barî bû kenza mestûr
Biton gîra bi zihor
Îzhar kir a'lemê mestûr

Îzhar kir ji bit'onî
Mabeyna kafê û nûnî
A'lem îna bîronî *[Bîronî: Wicûd û hebûn]*

Îcad kir bi wî terzî
Ji bo biroza kenzî
Ew dizanit h'îkmeta remzî

Rebbî, tu ferdî weh'îd
Yek leh'ze nabî beî'd
Eqrebtirî ez ji h'eblilwerîd
Adem îna Wicûdê
Ferman kire melekêt şihûdê
Bo Ademî herne sicûdê

Ewan bihîst ew xeber
Kes ji emrî neçû der
Îlla Îblîs bednezer

Ferman kir şahê wedûd
Digel Îblîs merdûd
Te bo çi nebir sicûd?

H'iccet îna leî'nî
Ez çêtirim bi yeqînî
Ez ji narî me, ew t'înî

Ew diket qal û qîla
Fayde neda delîla
Ew gerya bû ji zeyla

Îblîs kefte zilletê
Kir du'aya muhletê
Hetê roja Qiyametê *[H'etê: Heta]*

Xudê ew nekir meh'rom
Got muntezir be ya zelom
Hetê roja wextê mee'lom

H'al ku gerya sernegon
Zahir bû sirra meknon
Her kafir bû, ew melo'n

Melo'n miced bû li karî
Sond xar bi îzzeta barî
Ez dê însana kêşme narî

Dê wan kêşme xerîqê
Dê rûnme ser terîqê
Hemî renga wî beme h'erîqê

Xitab kir Rebbê îzzetê
Digel musteh'eq lee'netê

Ji h'alê dî xeber dem
Ewwil îzhar kir a'lem
Axir îcad kir Adem
Eger biken zilletê
Hindî biken tewbetê
Ez dê lê kem mexfîretê

Her kesê ku sergeş bit
Şubhê te, dê rûreş bit
Heqqê wî dê ateş bit

Ew melo'n bed efa'l
Bê edebê bê xîsal
Ew çend dirêj kir meqal

Dirêj kir digel şahê mecîd
Ew Îblîs wî merîd *[merîd: derkirî]*
Ji şerîkan may weh'îd

Bi sebebê wîh'detê
Bûye musteh'eqqê lee'netê
Ew gerya bû bi ser mee'siyyetê

Îblîs ku nebû nafii'
Ji emrê Xudê bû manii'
Lee'net lê kir şahê sanii'

Ew bû bi mena'a e'cûl
Ferman nekir ew qibûl
Ji mertebê geriya e'zûl

Şeytan ku ne bir sicûd
Ferman kir şahê wedûd
Xaric bibe ya merdûd

Lazime li ser e'bîda
Qibûl biken emrê seyda
Da nebin ji zumreya merîda

Ez li we dikem vê qissetê
Her kes guh bidetê
Bi xwe bigrît î'bretê

Nefs emmare bîsû *[Bîsû: Bi nebaşî]*
Hindî muhlet biden li dû

Ez dê li wan kem reh‘metê

Zû be, rabe ji newmê
Ji nefsa xwe bike lewmê
Ji xaliqî bike şermê

Ji xaliqî bi tenê
Bitirse ji mirinê
Terk bike vê dinê

Terk bike dunyayî
Bitirse ji lîqayî
Berê xwe bide fenayî

Tu bes bibe mexrûr e
Sefera te zor a dûr e
Menzîla te qebra kûr e

Menzîla qebrê teng e
Tu bizane ew çi reng e
Bê hewar û bê deng e

Bê deng û bê hewar e
Çar kenar lê dîwar e
Tejî dûpişk û mar e

Gava temam veşarî
Dê hête serê te hişyarî
Dê nazil bin qasidêt barî

Gava te tîne şihûdî
Dê te rakin h’alê qiû’dî
Sual diken ji te meqsûdî

Çi meqsûdî ew dê qesed ken
Sual xaliq eh’ed ken
Hem pirsane bi Eh’med ken

Eger cewab nebit sedîde
Guzra wan bêm h’edîde
Qalib diket le dîde

Guzra wan bêm kubare

Tewbe naket zû be zû

Ew dê mînit bi wê e’yşê
Qet namînit çi xweşî
Ji firaşa ateşî

Çi ateş û hem gorî
Melek wê li qebrê xorî [Xorî: Qîrîna bilind]
H’etê tenişt tîk perî

Ew meyt wey bê mefer
Taqet naket bête der
Dê li nik mînit korî kehr *[Kehr: Bê bîstin]*

Navêt wan bêm be tefsîr
Yek munkere, yek nekîr
Yan mubşêr hem beşîr

Cumle ê wan çar îsmin
Mesmayî wan du cîsmin
Têkda Emwat du qîsmin

Ew melekêt sah’ib kerb
Gava li meytî den d’erb
Hewar dê çine meşreq û mexreb

Dê guh lê bit denga wan
Xelqê erd û asîmanan
Xeyrî Cinn û însanan

Ger li guhî wan bidet
Dê bête tirs û heybet
Îman dê bêt bê minnet

Gava melek lê dixorî
Kafir dê li cewabê h’eyirî
Dê “Haha la edrî”

Eger cewab sedîd bit
Ezman dê lê fesîh‘ bit
H’alê wî dê melîh’bit

Cewaba dirist dê ew bî

Ger li çiyaya biden yek care
Dê ketin tûz û xubare

Bêjît Ellahû rebbî
We muh‘emmedûn nebîyyî

We ennel Îslam e dînî
Welquranû îmamî
Welkee’betû qîbletî

Eger çendîş xerab bî
Heqqê wî î’tab bî
Tu bêje sewabî

Welmuimînûn e îxwanî
Welmuimînatû exewatî
We Îbrahîmul xelîl Ebî

Nezim çenda seqîm bî
Nazir eger h’elîm bî
Dê ji tee’nê selîm bî

Gava temam bû cewab
Ji xeybê dê hêt xîtab
E’bdê min got ya sewab

Nezim eger bi rewac bî
Nazir eger be lucac bî
Bêşek ew dê h’erac bî

E’bdê min got ya h’eqî
Bo rabixî firaş û îstebreqî
Digel sundus û bal be beqî

Ji hîcretê dem xeber
Sala carî bû qeder
Raberî bû lefza e’mfer

Ji yumna tali’i û feleka
Xîtab dê hêt bo meleka
Bo e’bdê min vekin koleka [Kolek:Pencere]

Carî bûbûn çend sinon
Ji hîcretê raberî bûn
H’a û ra û xeyn û nûn

Koleka veken di cennetê
Xweş bêt bîna reh‘metê
Da nebînitin zeh’metê

Rebbî tuyî xafirî
Aza bikey şai’rî
Ji e’zaba agirî

Paş ku birya e û meqal
Le bo e’bdî xweş bû h’al *[Le bo:Ji bo]*
Ew dê ketin qesda mal

Rebbî tuyî rah’imî
Xelas bikey nazimî
Roja exza zalimî

Dê bîne wî meleke
E’bdo, tu we neke
Qesda mala xwe neke

Bi he’qqê sûreta Qafê
Hem sebebê vê îd’afê
Me xelas bikey ji xewfê

Qebrê ted ê bêt ava
Mîqdarê dîtina cava
Binqe weku bûk û zava

Rebbî tu şahê metînî
Me xelas bikey ji leî’nî
Weqtê ku navî tînî

Ev nezme nezma cedîd e
Şubhet wee’d û weî’d e
Îqtîda bi kelamê mecîd e

Weqtê neza’ sekeratê
Rebbî tubide rah’etê
Me xelas bikey ji zeh’metê

Eger e’ybek têda bî
Kes yar û bira bî
Zikir neket bi xerabî

Omêd her heye e’bda
Ji lutf û îkrama seyda
Aza bikey ji qeyda

Omêd heye e’bdê xerîb
Hîvîkare bendê xerîb
Bo reh’meta rebbê qerîb

Nav dê kem bi î’lam
Bibeyan û hem kelam
(E’bdî) mud’af bîl (Selam) [*Navê şaîr e*]

Eger bibêjit sail
Ev îsme nabit kamil
Qeyda wî nabit daxil

Medfûe’tinew mesel
Qeyda wî dê bit daxil
Bi h’ukmê mecazî mursel

Ew Xalidî Zîbarî
Hîvî diket ji barî
Aza bikey ji narî

Xalidî me bi terîqet
Zîbarî me bi e’şîret
Barzanî me bi mesken qeryet

Rebbî aza bikey e’bdê talih’
E’fo bikey mirîdê salih’
Bi h’urmetê ennebîlfatih’

(Nivîsandina **Pê Reş**)
(Tîpguhastin: **Cankurd**)